Ji Penûsê Jinê Rastiye Jiyanê

RAPERÎN

Dîrok: Çile 2022 Hejmar: 04

Jin Wê Bi Rihê 8'ê Adarê Dagirkeriyê Têk Bibin

النساء بروح ٨ أذار ستهزم الأحتلال

Em di pêvajoyeke gelekî girîng de ber bi 8'ê Adarê roja cîhanî ya jinên kedkar ve diçin. Em li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî wek jin 8'ê Adareke din di bin gefên şer û dagirkeriyê de pêşwazî dikin. 8'ê Adarê di rûpela dîroka têkoşîna azadiya jin de bêgûman rojeke gelek girîng e. Em vê rojê nikarin tenê wek rojeke wek cejn bigirin dest. Ji ber ku 8'ê Adarê bingeha herî esas a têkoşîna jinên cîhanê ye. Ji bo ku em wateya 8'ê Adarê baş nas bikin pêwîst e di destpêkê de bi kurtasî dîroka wê nas bikin. Dîroka wê bêguman li ser bingeha têkoşîna jinên sosyalîst û komûnîst ava dibe. Ev dîrok dîrokeke sed salan e.

Îro jinên komûnîst û tevgera komûnîst li ser vê bingehê têkoşîna xwe didin meşandin. Ji ber ku îro şoreşa jin a Rojava ji bo şoreşên herêmî û afirandina şertên şoreşê di Rojhilata Navîn de erka me ya herî sereke ye. Li dijî pergala serdestiya baviksalarî bi heman ferasetê xwe di Rojhilata Navîn de ava dike. Li hember wek jin afirandina mekanîzmeyeke hevbeş a jinan di bin navê "enternasyolîzma jin" de erka herî sereke ye. 8 Adarê roja cîhanî ya jinên kedkar bingeha vê ya herî xûrt e. Divê em vê esasê hem ji bo misogeriya destkeftinên şoreşa jinê hem jî ji bo avakirina yekîtiya têkoşîna jinê bigirin dest.

نحن نتوجه بخطوة مهمة للغاية نحو الثامن من اذاراليوم العالمي للمرأة العاملة..

نحن في روج أفا وشمال شرق سوريا كنساء نستقبل الثامن من آذار آخر تحت تهديد الحرب والاحتلال. يعتبر الثامن من مارس بلا شك يومًا مهمًا للغاية في تاريخ نضال المرأة من أجل الحرية. لا يمكننا التعامل مع هذا اليوم كعطلة. لأن الثامن من آذار هو اليوم الأكثر أهمية في نضال النساء في العالم. من أجل فهم معنى ٨ آذار بشكل كامل ، من الضروري أولاً تحديد تاريخه بإيجاز. يعتمد تاريخها بلا شك على نضال المرأة الاشتراكية والشيوعية. هذا التاريخ عمره مائة عام..

اليوم ، تخوض المرأة الشيوعية والحركة الشيوعية نضالها على هذا الأساس. لأن ثورة المرأة في روج أفا اليوم هي أهم مهمة لنا للثورات الإقليمية وتهيئة الظروف للثورة في الشرق الأوسط. ضد نظام الهيمنة الأبوية يبني نفسه في الشرق الأوسط بنفس العقلية. إن إنشاء آلية مشتركة للنساء كنساء تحت اسم "الأممية الأنثوية" هو أهم مهمة. ٨ مارس ، اليوم العالمي للمرأة العاملة ، هو أقوى أساس لذلك. يجب أن نتبنى هذا المبدأ لضمان إنجازات الثورة النسائية ولبناء وحدة النضال النسائي..

2 NÊRÎN: Li Dijî Serdestiya Zilam Şer Bike

8 ROJEV: Mîrasê Clara û Roza agirê têkoşîna me geş dike

10 DOSYE: Rizgariya Jinên Efxanî Rizgariya Tevahî Jinên Bindest e

Li Dijî Serdestiya Zilam Şer Bike Ji bo Wekhevî û Azadiyê Bi Rêxistin Bibe

Şoreşa me ya Rojava di sala xwe ya 10'an de ye. Di van 10 salan de di qada têkoşîna jinê de gavên gelekî mezin hatin avêtin. Jina ku bi rih, aqil û bedena xwe hapsî jiyana hundirê malê bûbû ji bo avakirina jiyaneke nû rabû ser piyan. Li dijî serdestiya zilam serî hilda. Li dijî rejîma Esad, hovitiya DAÎŞ û dewleta Tirk a mêtînger û dagirker helwesteke bibiryar pêşan da. Li gundan û bajaran jinên kedkar ên malan, mamoste, kedkarên tendûristî, karkerên çandinî, xwendekar, jinên ciwan, bûn yek û di pêşengtiya jinên şoreşger de li Bakur û Rojhilatê Sûrî şoreşeke demokratîk pêk anîn. Di têkoşîna polîtîk a leşgerî de û di hemû qadên Rêveberiya Xweser de jinan bi awayekî çalak cihê xwe girtin. Jinan bi vê sayê ferî şerkirin û birêvebirinê bûn. Îro fermandarên me, dîplomatên me, nûnerên me yên polîtîk, hevserokên me yên şaredarî, kanton û HWD. Hene. Jinên ku du di nav civakê de navên wan tune bûn îro damêzrênerên jiyaneke nû. Ev asta ku şoreşê jin gîhandiyê ye gelekî girînk e. Misogeriya vê astê di di zagon û qada hiqûqî de ji bo tevahî jinan deskeftineke gelekî mezin e.

Lê divê em ji bîra nekin ku dîroka serdestiya zilamperest û dewletê ku derbasî nav hev bûye ew qasî kûr e ku hemû gavên ku hatine avêtin û rexmî sekna bibiryar azadbûna jinê hîna di destpêka rê de ye. Şoreşa me hîna gavên xwe yên yekemîn avêtin. Cihê jinan di asta nûnertiya wekhev ku di bingeha zahonî de hatiye avêtin û di asta rêveberiya dumend de bi cihê jinan a di nav jiyana civakî de ne wekî hev e. Bêguman rastiya jinê ku bi hezar salan hatiye tunekirin û bindestkirin di 10 salan de bi awayekî kamil nayê azadkirin. Encax ji bo vê sedan sal jî ne pêwîst e. Asta herî pêşketî ya cîhana milkê taybet ku koledariya jinê afirandiye kapîtalîzm e, bingeha wê jî riziya ye. Nakokiya sermiyan û kedê, nakokiyên navbera jin û zilam, nakokiyên serdestiya zilam û nasnameyên bindest her ku diçe tûj dibe. Derfetên qewastina şoreşgerî hîna zêdetir dibe. Şoreşa me ya Rojava ku bi ev gava xwe ya yekemîn ket sedsala 21'emîn jixwe xwedî derfetane ku hîna zêdetir bi pêş de bimeşe.

Ji ber vê yekê erka yekemîn parastina şoreşê ye. Qasî di mewziyan de parastina vê şoreşê parastina vê şoreşê di nav jiyanê de û avakirina wê jî erka me ye. Û ev şerekî hîna dijwar e. Di şerê di eniyan de dijmin xûya ye, ref zelal in. Lê di şerê li dijî fêbûnên civakî yên paşverû û şerê li dijî feraseta serdestiya zilam de rewş hinekî tevlî hev e. Di vî şerî de noxte hene. Di aliyekî de pêwîst e jin li dijî hînbûniyên xwe yên civakî, di aliyê din de jî pêwîst e li dijî feraseta civakî ya serdestiya zilam şer bike. Di vî şerî de sîlaha jinê ya herî mezin ku pê serkeftinê bi dest bixe hêza jin a rêxistinkirî ye. Û ev hêzeke wiha ye ku ne fûze, grant, bombeyên bi sed hezaran tonan nikare vê hêzê bide sekinandin.

Bidestxistina vê sîlahê qet ne zahmet e. Nê pêwîst e em li benda tiştekî din bibin. Ji bo vê pêwîst î ne bi teknîkê ne bi pere heye. Ji bo vê pêwîstî tenê bi baweriya rêxistinbûnê heye. Divê em zanebûna zayendî ya jin wek exlaqa jina nû bibînin, têkoşînê ji bo xwe û jinan wek nirxeke exlaqî fêhm bikin.

Ger jinek rastî tundiyê tê ew tenê ne qelsbûna wê jinê ye. Ev di heman demê de qelsbûna jinên ku vê dizanin û ji bo vê têkoşîn nakine jî. Ger jinek rastî tacîz û destdirêjiyê were ev êrîşeke li hember tevahî jinan e. Ger zarokek bi zorê tê zewicandin ev zora paşverû li hember me hemûyan e. Ger jinek mecbûr tê hiştin ku bi zorê bibe hewî ev lawaztiya me ya hemûyan e. Jina ku hema li keleka me tenê ye û bêçare ye ev bêçaretiya me ya hemûyan e. Ger jinek bi biryara eşîra xwe tê kuştin ev tê wateya ku li wir şoreşa me tê xistin bin lingan. Îro li vir hema hema li mala herkesî sûretê jinên ku ji bo vê şoreşê canê xwe fidakirine daliqandiye.

Em ê çawa xwedî li mîrasê ku wan ji me re hiştiye derkevin. Gelo em ê bêjin mijara kar û xwerin em ji hev dûr xistine? Gelo em ê bêjin van mijaran berpirsiyartiya me ya li dijî şehîd û şoreşê ji me da ji bîr kirin? Lê em ê em ê vê çawa layiqê xwe û şoreşa xwe bibînin? Ger ne ûsa be pêwîst e em xwe bi rêxistin bikin. Divê em xweparastina xwe xûrt bikin. Xwe parastin li dijî her cûre serdestiya zilamperest di her qadê de rêxistinbûyîn e. Divê em xweparastinê hem li dijî dijminên xwe yên der ve hem jî li dijî dijminên xwe yên hundir bilind bikin. Heta ku bayê paqij ê şoreşê nekeve hundirê malan û her mal ji bo jinan nebe cihekî berxwedanê şoreşa me nikare pêş de biçe. Şoreşê hîna bi gîştî pirsgêrêka kar û xwerin çaresar nekiriye. Lê em nikarin vê mijarê bizivrînin lawaz parastina şoreşê. Ji bo çaresariya van mijarên sereke yên jiyanê divê em bingeha şoreşê hîna xûrtir bikin.

Şoreşa jin di têkîliyên civakî de çiqasî xwe ava bike wê demê dikare pêş bikeve. Lingê vê yê herî girînk rêxistinbûyîna jin e. Dema jin birêxistin nebe guhertina civakî nayê dabîn kirin. Zagonên jinê yên Rêveberiya Xweser azadbûna jinê esas digire. Ji bo ku ev zagon di jiyanê de bi cih bên rêxistinbûneke girêdayî wê pêwîst e. Em tenê nikarin bêjin zaten qanûnên me hene. Dema hêza rêxistinbûna jinan tune be wateya wan zagonan jî nabe.

Ji bo ku zagon bi cih werin pêwîstî bi hêzeke jin ku zanebûna xwe ya zayendî bilind e heye. Hêza me di rêxistinbûna me de ye. Rêxistinbûn û girêdana hemû jinan rêxistinê ve erka tevahî jinan e. Xeyalên di nav têlêvîzyon, întêrnêt û xeyalên Ewropa ji me re azadiyê nayne. Gelo em jiyaneke hîna baş, kêfxweş û azad dixwazin? Ji bo vê divê em şoreşa xwe û axa xwe biparêzin.

Ger em Efrîn, Serê Kaniyê û Şengalê ji bîra bikin em ê çawa li rûyê hev binêrin. Jin û gelekî ku nikare xwe biparêze li tu derê rêzdariya xwe tune ye. Na, pêwîst e em rêzdariya (îhtîram) li hember şexsiyeta xwe winda nekin. Deqeyeke ku em winda bikin tune ye. Em deqekê winda bikin wê pergala baviksalarî ya kapîtalîzmê emrê xwe hinek din dirêjtir bike. Wê zilme li ser gelan û jinan vereşe. Divê em bi dûr sekînina ji rêxistinbûnê û nêzikatiya ku "zaten hinek ji bê têkoşîn dikin" nebin şirîkê vê zilmê.

Bi rêxistinbûna di TKŞ'ê de bi erkgirtina di meclîsên JKŞ'ê û CKŞ'ê de ji bo bi cih anîna perpirsiyartiyên xwe gav bavêjin.

Li pêşiya me 8'ê Adarê heye. 8'ê Adarê ji bo têkoşîna azadiya jin kêliyeke dîrokî ya girîng e. Di qadên cûda cûda yên Bakur û Rojhilatê Sûrî de, li çar parçeyê Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê wê jinên karker, kedkar, bindest û LGBTÎ berxwedaneke yekbûyî ya jinan birêxistin bikin. Şoreşa me ya Rojava wek mewziyê vê berxwedanê yê herî pêşverû hêvî dide hemû jinan. Di vê mewziyê de wê ala şoreşa me ya jin bilind bibe. Jinên Rojava û pêşengên wan ên şoreşger û komûnîst bilindkirina vê alê wek erka xwe ya yekemîn dibînin.

Rexmî tevahî êrîşên mêtînger, dagirker û kapîtalîst ew al wê bilind bibe...

سنحارب ضد هيمنة الذكور ونتنظم من أجل المساواة والحرية

ثورتنا روج أفا في عامها العاشر . خلال هذه السنوات العشرة ، تم قطع أشواط كبيرة في مجال نضال المرأة. المرأة التي كانت عالقة داخل المنزل بروحها وعقلها وجسدها نهضت على قدميها لبناء حياة جديدة. تمردت على هيمنة الذكور. لقد اتخذت موقفاً حازماً ضد نظام الأسد ووحشية داعش والدولة التركية المحتلة. في المناطق الريفية والحضرية ، اتحدت عاملات المنازل ، والمعلمات ، الصحيات ، والعاملات الزراعيات ، والطلاب ، والشابات ، وقاموا بثورة ديمقراطية في شمال وشرق سوريا بقيادة نساء ثائر. قامت النساء بدور نشط في النضال السياسي للجيش وفي جميع مجالات الحكم الذاتي. كانت المرأة قادرة على القتال والإدارة بهذه الطريقة. اليوم قادتنا ودبلوماسيونا وممثلونا السياسيون ورؤساء البلديات والكانتونات والمجلس الأعلى للرعاية. هناك. النساء اللواتي ليس لهن أسماء في المجتمع اليوم هن مؤسسات حياة جديدة. هذا هو المستوى الذي وصلت فيه الثورة النسائية إلى مستوى بالغ الأهمية. ويعد ضمان هذا المستوى إنجازًا كبيرًا لجميع النساء في المجال القانوني.

لكن يجب ألا ننسى أن تاريخ الهيمنة الذكورية والدولة التي تسير جنبًا إلى جنب عميق جدًا لدرجة أن جميع الخطوات التي تم اتخاذها والمرحلة الحاسمة لتحرر المرأة لا تزال في بداية الطريق. لا تزال ثورتنا تخطو أولى خطواتها. إن مكانة المرأة في مستوى التمثيل المتساوي المنصوص عليه في الدستور وعلى مستوى إدارة مشتركة ليست هي نفسها مكانة المرأة في الحياة الاجتماعية. بالطبع ، حقيقة المرأة التي تم إبادتها واضطهادها منذ آلاف السنين لم تتحرر بالكامل خلال ١٠ سنوات. لكن هذا ليس ضروريًا لمئات السنين. إن المستوى الأكثر تقدمًا في عالم الملكية الخاصة الذي خلقته عبودية الإناث، هو الرأسمالية التي أساسها الفساد. تزداد حدة صراعات رأس المال والعمل ، والصراعات بين النساء والرجال ، وصراعات الهيمنة الذكورية والهويات المضطهدة. إن فرص الانتصار الثوري أكبر. إن ثورتنا في روج افا ، التي دخلت القرن الحادي والعشرين بهذه الخطوة الأولى ، لديها بالفعل فرصة للمضي قدمًا إلى أبعد من ذلك.

لذا فإن المهمة الأولى هي الدفاع عن الثورة. من واجبنا أن ندافع عن هذه الثورة في الحياة وأن نبنيها في جميع المناصب. ولا تزال هذه معركة صعبة. في المعركة يظهر العدو على الجبهات والحكام واضحون. لكن في الحرب ضد المصالح الاجتماعية المتخلفة والحرب ضد مفهوم سيطرة الذكور ، فإن الوضع متشابك إلى حد ما. هناك نقاط في هذه الحرب. من ناحية ، من الضروري أن تحارب المرأة ضد تعاليمها الاجتماعية ، ومن ناحية أخرى من الضروري محاربة التصور الاجتماعي للسيطرة الذكورية. أعظم سلاح للمرأة في هذه الحرب لتحقيق النصر هو القوة المنظمة للمرأة. وهي قوة لا يمكن لأي صواريخ أو قذائف أو قنابل بمئات الآلاف من الأطنان أن توقف هذه القوة.

الحصول على هذا السلاح ليس بالأمر الصعب. لا يتعين علينا انتظار أي شيء آخر. ليست هناك حاجة للأسلوب أو المال من أجل هذا. لهذا هناك حاجة فقط للثقة التنظيمية. يجب أن ننظر إلى المعرفة الجنسية للمرأة على أنها أخلاق المرأة الجديدة ، وأن نفهم النضال من أجل الذات والمرأة كقيمة أخلاقية.

إذا كانت المرأة تعاني بالفعل من العنف ، فهذا ليس مجرد ضعفها. وهو أيضا ضعف المرأة التي تعرف هذا ولا تحارب من أجله. إذا تعرضت المرأة بالفعل للتحرش والإساءة فهذا اعتداء على جميع النساء. إذا تم تزويج طفل قسراً ، فهذه القوة المتخلفة هي ضدنا جميعًا. إذا أُجبرت المرأة على الحمل فهي ضعفنا جميعًا. المرأة التي تكاد تكون وحيدة في قلعتنا وعاجزة هي عجزنا جميعًا. إذا قُتلت امرأة بقرار قبيلتها فهذا يعني أن ثورتنا تُداس بالأقدام. اليوم ، لدى كل فرد في المنزل تقريبًا صورة لنساء ضحوا بحياتهن من أجل هذه الثورة.

كيف نخرج من الإرث الذي تركوه لنا. هل نقول موضوع العمل والطعام قد فرقا بيننا؟ هل نقول إن هذه الأمور أنسينا مسؤوليتنا عن الاستشهاد والثورة؟ لكن كيف سنجد أنفسنا جديرين بهذا وبثورتنا؟ إذا لم يكن الأمر كذلك ، فنحن بحاجة إلى تنظيم أنفسنا. يجب أن نعزز دفاعنا عن النفس. يتم تنظيم الدفاع عن النفس ضد كل أشكال سيطرة الذكور في كل مجال. يجب أن نرفع دفاعنا عن النفس ضد أعدائنا الخارجيين وضد أعدائنا الداخليين. لا يمكن لثورتنا أن تمضي قدما حتى تدخل رياح الثورة النقية البيوت ويكون كل بيت مكانا لمقاومة المرأة. لم تحل الثورة بعد مشكلة العمل والغذاء بشكل كامل. لكن لا يمكننا أن نحول هذه القضية ضعيفاً للدفاع عن الثورة. لحل هذه القضايا الرئيسية في الحياة ، يجب علينا تعزيز أسس الثورة بشكل أكبر.

كيف يمكن للثورة النسائية أن تبني نفسها في العلاقات الاجتماعية يمكن أن تتطور. أهم جزء في هذا هو تنظيم النساء. التغيير الاجتماعي غير مضمون عندما لا تكون المرأة منظمة. يقوم قانون الحكم الذاتي للمرأة على تحرير المرأة. من أجل تطبيق هذه القوانين في الحياة ، ستكون هناك حاجة إلى منظمة تابعة. لا يمكننا أن نقول فقط أن لدينا قوانين الطبيعة. عندما لا تتمتع النساء بسلطة التنظيم ، فليس لديهن قوانين.

من أجل إنفاذ القانون ، يجب أن تكون هناك قوة أنثوية لديها مستوى عالٍ من الوعي الجنسي. قوتنا تكمن في منظمتنا. تنظيم وربط جميع النساء في المنظمة هو مسؤولية جميع النساء. الأحلام في التلفزيون والإنترنت وأحلام أوروبا لا تمنحنا الحرية. هل نريد حياة طيبة وسعيدة وحرة؟ لهذا يجب علينا الدفاع عن ثورتنا وأرضنا. إذا نسينا عفرين وسري كانيه وكري سبي فكيف سننظر إلى بعضنا البعض؟ النساء والكثير من الذين لا يستطيعون حماية أنفسهم لا يحترمون في أي مكان. لا ، يجب ألا نفقد احترامنا لهويتنا. لا توجد دقيقة نخسرها. نفقد دقيقة واحدة ستطيل أمد النظام الأبوي للرأسمالية لفترة أطول قليلاً. سوف يجلب الاضطهاد على الناس والنساء. يجب ألا نتواطأ في هذا القمع بالابتعاد عن التنظيم والنهج الذي "يكافح بعض الناس بدونه".

اتخذ خطوات للوفاء بمسؤولياتك من خلال التنظيم في TKŞ من خلال شغل مناصب في مؤسسات JKŞ و CKŞ.

أمامنا الثامن من آذار (مارس). يعتبر الثامن من آذار لحظة تاريخية مهمة في النضال من أجل حرية المرأة. في أجزاء مختلفة من شمال وشرق سوريا ، في أربعة أجزاء من كردستان والشرق الأوسط والعالم ، ستنظم النساء العاملات والعاملين والمضطهدين والمثليين ومزدوجي و LGBTİ مقاومة موحدة للنساء. إن ثورتنا الغربية بصفتها موقف هذه المقاومة الأكثر تقدمية تمنح الأمل لجميع النساء. في هذا الموقف سنرفع علم ثورتنا النسائية. ترى النساء في روج افا وقادتهن الثوريون والشيوعيون أن رفع هذا العلم هو واجبهم الأول.

رغم كل الهجمات الإرهابية والاحتلال والرأسمالية سنرفع هذا العلم ...

تذكارية الشيوعية ساريا اوزكور في القامشلي

أقيمت تذكارية قائدة حزب الشيوعي الماركسي اللنيني ساريا اوزكورفي القامشلي وجاء في الذكرى "استشهدت ساريا اوزكور من أجل الثورة وسنسير على طريقهم ونجعل الثورة عظيمة". زرعو أشجار التفاح في الذكارية .

كما حضر أعضاء الحركة الشيوعية الثورية التذكارية

قرأت أعضاء المراة الشيوعية الثورية البيان في حديقة القيادة بحي هيلالية ورددوا شعار "الشهيدة سارية خالدة".

قرأت عضو المراة الشيوعية الثورية جيهان أحمد البيان في الذكرى. وأشارت أحمد إلى أن الشهيدة سارية كانت أول شهيدة لحزب الماركسي اللنيني في روج آفا وكانت من قيادات مقاومة كوباني في المقاومة التاريخية في كوباني. واستذكرت أحمد في حديثه كلمات الشهيدة سارية قبل استشهادها "نحن في روج افا لن نذهب إذا لزم الأمر. سنستشهد من أجل الثورة" ورفعت سلاحها وسارت على العدو.

وقالت جيهان أحمد:نحن كشيوعيين في روج افا لا نترك إرث الشهيدة وسنكون أتباعها في طريق الحرية والثورة الشهيدة ساريا استشهدت من أجل الثورة ، ونعد أيضًا أننا سنحدث الثورة ونكبرها سنقدم ثورة روج افا نحو الاشتراكية.

بعد الخطب زرعو شجرة تفاح تخليداً لذكرى الشهيدة ساريا. واختتام التذكارية بأغنية وشعار "شهداء لا يموتون".

Li Qamişlo Komûnîstan Sarya Ozgûr Bi Bîr Anî

Ji bo Fermandara MLKP'ê Sarya Ozgûr li qamîşlo bîranîn hat lidarxistin. Di bîranînê de hat gotin "Sarya Ozgûr ji bo şoreşê şehîd ket, em ê di rêya wê de bimeşin û şoreşê mezin bikin. Di bîranî de ji bo bîranîna wê darên sêvan hat çandin. Endamên JKŞ'ê li Parka rêbertiyê ya taxa Hêliliyê daxuyanî xwend û di daxuyaniyê de diruşmeya "Şehîd Sarya Nemir e" hat avêtin.

Di bîranînê de endama JKŞ'ê Cîhan Ehmed daxuyanî xwend. Ehmed da xuyakirin ku şehîd Sarya li Rojava yekemîn şehîda jin a MLKP'ê ye û di berxwedana dîrokî ya Kobanê de yek ji fermandarên pêşeng a berxwedana Kobanê bû. Ehmed di axaftina xwe de gotina şehîd Sarya ya berî şehîd bikeve a "em li Rojava ne, naçin ger pêwîst bike em ê ji bo şoreşê şehîd bikevin" bi bîr anî got raxt û sîlaha xwe rakir û bi ser dijmin de meşiya.

Cîhan Ehmed got "Em wek komûnîstên Rojava xwedî li mîrasê şehîd Sarya derdikevin, em ê di rêya wê de bimeşin, em ê di rêya azadî û şoreşê de bibin şopdarên wê, Şehîd Sarya ji bo şoreşê şehîd ket, em jî soz didin em ê şoreşê mezin bikin, em ê şoreşa Rojava ber bi sosyalîzmê ve pêş bixin.

Piştî axaftinan ji bo bîranîna şehîd Sarya dara sêvê çandin.

Misogeriya Şoreşa Jinê Rêxistinbûyîna Jinên Ciwan e

Me wek jinên ciwan ya Rojava, di şoreşa Rojava de cihê xwe girt û şoreşa xwe afirand. Şoreşa jinê ya Rojava di azadiya jinê de bû wateyeke nû. Îro herî zêde ciwan bi taybet jî jinên ciwan li şoreşa jinê ya Rojava xwedî derdikevin. Vîna ku ji aliyê şoreşê ve derket holê ji hemû jinan re dibe mînak û pêşeng. Li vir divê em berî her tiştî bêguman rola artêşa jinê bînin ser ziman. Piraniya artêşa jin ji şervanên jinên ciwan pêk tê. Vê vînê, çeteyên DAIŞ'ê têk biriye û îro jî li hemberî çeteyên dewleta Tirk û dagirker disekine. Hêzên jinên ciwan, hem di aliyê şer de hem jî di aliyê xwedi derketina şoreşê ve sekna xwe nîşan dide. Şoreşa Rojava di qada civakî de bergeha şoreşa jinê û bi vina jinê xwe birêxistin dike. Misogeriya hêz û vîna jinên ciwan mezinkirina saziya jinan, xwedî derketina zagon û destkeftiya şoreşê ye.

Îro şoreşa Rojava ya jinê di asteke nû de ye. Li aliyekî şoreşa jinê hem bi saya pergala şoreşê hem jî bi zagon û destkeftiyên şoreşa jinê pêş vê diçe. Hem cihên cihên ku hatine dagirkirin de, hem jî di xakên azad de li dijî polîtîkayên şerê taybet li ber xwe dide. Dewleta Tirk a dagirker herî zêde di Efrîn û Serê Kaniyê de dixwaze vîna jinan bişkîne destkeftiyen şoreşe li wir tune bike. Revandin, tacîz, tecawiz, tundî, zewacên zêde, zewacên temenê biçûk herî zêde jî li ser jinên ciwan tê meşandin. Bi riya medyaya civakî xeyalê Ewropa û zewacê riya rizgarî tê nişanî jinan dayin.

Ji ber vê divê jinên ciwan di xaka şoreşê de bi hêza şoreşê ji bo bidestxistina azadiya xwe li hemberî hemû feraseta paşverû bisekine. Azadî bi rêya Ewropa an jî zewacê nayê. Kengê şoreş bikeve hundirê malan û di vir de şoreşa fikrî dest pê bike wê demê jin dikare bigîhÎje azadiya xwe. Heta ku em karibin li ser jiyan û bedena xwe biryara xwe bidin em wê demê dikarin azadiya xwe bi dest bixin. Jinên ciwan ji bo şoreşa jinê hêzeke veguherîner û pêşveber e. Lê pêwîst e divê em wek jinên ciwan li dijî kevneşopiyên civakî, feraseta resmaliyet û feodalîzmê destpêkê de pêwîst e kesayeta xwe li gorî rastiya şoreşê biguherînin. Pêşketina şoreşa jin girêdayî pêşketina jinên ciwan e.

Di sedsala 21'emîn de îspat bû ku berxwedana jinê li her derê ye, vîn û ramana şoreşa jinê li her derê belav dibe. Me mînaka vê ya herî şênber li Rojava dît. Di cîhanê de agirê têkoşînê ku ji aliyê jinan ve hatiye pêxistin dibe nîşana hevbeş a jinan. Di têkoşîna me ya hemû jinan de bi şêwaza bidestxistina azadiya xwe em dikarin jiyaneke hevbeş ava bikin.

Armanca dijminê jinan, xwesteke dûrxistina jinan a ji jiyana civakî ye. Ev xwestek jî têre nake ku li ser bedena me biryar didin. Ji bo vê xwesteka me ya jinên ciwan di dest pêkê de azadiya zayendî ye. Em bi rêya azadiya zayendî dikarin mafa biryardayina li ser jiyan û bedena xwe bidin. Ger em bixwazin biryarên li jiyana xwe bixwe bidin pêwîstiya me ya herî mezin vina azadiyê heye. Ji ber vê di seranserî cîhanê de jin bi xwestekên cûr bi cûr derdikevin qadan.

Em ê wek jinên ciwan ên Rojava, têkoşîna jinên ku di çar aliyê cîhanê li Rojava mezin bikin. Ev jî ji bo me tê wateya xwedî derketin û parastina şoreşê. Ji ber vê yekê em ê li dijî êrîşên li ser Rojava bisekinin û şoreşa xwe bi çekê destê xwe biparêzin. Erka xurtkirina agirê şoreşê li ser milên jinên ciwan e.

Di pêvajoyên pêş me de erk û berpirsiyariya jinên ciwan a herî mezin û taybet rêxistinbûna di nav jinên ciwan de ye. Di nav refên şoreşê de vîna jinên ciwan çiqasî xurtir bibe siyaseta şerê taybet ên li ser jinan ew qas vala derdikeve. Hişmendiya jinên ciwan çiqasî xurtir bibe ew qas dikare li dijî tacîz, destdirêjî, tundî, zewaca zêde, zewaca temenê biçûk têbikoşe. Li ser vê esasê xwesteka azadiya zayendî bi rêxistinbûna di nav jinên ciwan de pêkan dibe. Ji bo vê divê em hîna bêtir di nav girseyên jinên ciwan de bixebitin polîtîqayên li ser azadbûna jinên ciwan pêş bixin.

Divê em destekftiyên şoreşa xwe biparêzin û li hemberî hemû êrîşan wek Arîn, Sarya, Destan û Zîlanan şer bikin. Çalakên şoreşa jinê jinên ciwan in. Ev şoreş bi vîna jinên ciwan mezin dibe.

ضمان ثورة المرأة هو تنظيم الشابات

نحن ، كشابات روج افا ، أخذنا مكاننا في الثورة وخلقنا ثورتنا الخاصة. كان لثورة المرأة في روج افا معنى جديد في تحرير المرأة. اليوم معظم الشباب ، وخاصة الشابات ، لهم نصيب في ثورة المرأة. في روج افا تصبح إرادة الثورة قدوة ورائدة لكل النساء. هنا يجب أن نذكر أولاً دور الجيش النسائي. غالبية الجيش النسائي يتكون من الشابات المقاتلات. هزمت هذا النبيذ عصابات داعش واليوم تقف ضد عصابات الدولة التركية والمحتل. تظهر قوى الشابات دعمها سواء من جانب الحرب أو من جانب اصحاب الثورة. الثورة في روج افا هي مركز ثورة المرأة في المجال الاجتماعي وتنظم نفسها بإرادة المرأة. إن ضمان قوة وإرادة الشابات هو نمو مؤسسة المرأة وإصدار القانون وتحقيق الثورة. اليوم ثورة المرأة الغربية في مستوى جديد. من ناحية أخرى ، تتقدم الثورة النسائية بفضل النظام الثوري والقوانين والإنجازات التي حققتها ثورة المرأة. تقاوم سياسات الحرب الخاصة في كل من الأراضي المحتلة والأراضي الحرة. الدولة التركية المحتلة تريد كسر إرادة المرأة في عفرين وسري كانيه وتحطيم منجزات الثورة. هناك الخطف والتحرش والاغتصاب والعنف والزواج المفرط وزواج القاصرات هي الأكثر شيوعًا بالنسبة للشابات. عبر وسائل التواصل الاجتماعي ، يظهر حلم أوروبا والزواج للمرأة.

لهذا السبب يجب على الشابات في أرض الثورة الوقوف في وجه كل التصورات المتخلفة بقوة الثورة لتحقيق حريتهن. الحرية لا تأتي عبر أوروبا أو الزواج. عندما تدخل الثورة البيوت تبدأ هنا الثورة الفكرية عندها يمكن للمرأة أن تحقق حريتها. طالما يمكننا اتخاذ قرارات بشأن حياتنا وأجسادنا ، يمكننا عندئذٍ تحقيق حريتنا. الشابات قوة تحويلية وتقدمية للثورة النسائية. لكننا نحن الشابات نحتاج إلى تغيير شخصيتنا وفقًا لواقع الثورة ضد التقاليد المجتمع ومفهوم الشكلية والإقطاعية. إن تطور ثورة المرأة يعتمد على تطور الشابات. في القرن الحادي والعشرين ، ثبت أن مقاومة المرأة منتشرة في كل مكان ، وأن إرادة وفكرة ثورة المرأة تنتشر في كل مكان. لقد رأينا أوضح مثال على ذلك في روج افا. في عالم تصبح فيه نار النضال التي تشعلها النساء رمزا مشتركا للمرأة. في كفاحنا لجميع النساء مع أسلوب الحصول على حريتنا يمكننا بناء حياة مشتركة.

هدف العدو المرأة هو الرغبة في إقصاء المرأة عن الحياة الاجتماعية. هذه الرغبة لا تكفي لاتخاذ قرار بشأن جسدنا. لهذا فإن رغبتنا في الشابات هي الحرية الجنسية أولاً وقبل كل شيء. من خلال الحرية الجنسية يمكننا ممارسة الحق في اتخاذ القرار بشأن حياتنا وجسدنا. إذا أردنا اتخاذ قرارات في حياتنا ، فنحن بحاجة ماسة إلى الحرية. هذا هو سبب خروج النساء في جميع أنحاء العالم إلى الساحات برغبات مختلفة.

نحن ، كشابات في روج افا ، سنكافح من أجل حرية النساء في روج افا وجميع العالم. هذا يعني أيضًا أن نمتلك الثورة وندافع عنها. لذلك سنقف ضد الهجمات على مناطقنا وندافع عن ثورتنا بالسلاح. مهمة تأجيج نار الثورة على عاتق الشابات.

في عملياتنا المستقبلية ، يتمثل أكبر وأهم واجب ومسؤولية للشابات في التنظيم بين الشابات. كلما كانت إرادة الشابات في صفوف الثورة أقوى ، كلما أصبحت سياسات الحرب الخاصة ضد النساء فارغة. كلما كان وعي الشابات أقوى كلما قورن بمكافحة التحرش والإساءة والعنف والزواج المفرط والزواج دون السن القانونية. على هذا الأساس تتحقق الرغبة في الحرية الجنسية من خلال التنظيم بين الشابات. وتحقيقا لهذه الغاية ، يجب أن نعمل بجدية أكبر بين جماهير الشابات لتطوير سياسات تحرر الشابات.

يجب أن ندافع عن مكاسب ثورتنا ونحارب كل الهجمات مثل (ارين و سارية ودستان و زيلان). ناشطات ثورة الشابات. هذه الثورة تنمو بإرادة الشابات.

Di Nav Rêveberiya Xweser De Vîna Jinê Tê Xûrtkirin

Şoreşa me ya ku di 19'ê Tirmeha 2022'an de hatiye îlankirin di heman demê de wek şoreşeke jinê jî pêş ket. Bi bedelên mezin û têkoşînên girîng gav bi gav rizgarbûna axên me ji dagirkeriya DAÎŞ'ê şoreşa me ber bi şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûrî ve berfireh bû. Deh sal e hem di çeperên şer de bi parastina şoreşê hem jî ji bo avakirina perhala nû kar û xebat berdewam dikin. Yek ji cûdatiya pergala me ya rêxistinbûna ixdidara dumend e. Di hemû sazî û rêxistinan de hevserokatî, bûroyên jinê, meclîsên jinê tên avakirin. Ji rêveberiya xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî bigire heta Rêveberiyên Xweser ên herêman, rêveberiyên herêmî, li kantonan komîteyên jinê û koordînasyonên jinê hatine avakirin.

Heta berî salekê dîsa koordînasyona jinê di nav Rêveberiya Xweser de têkîldarî jinan kar û xebat didan meşandin, lê ne di nav Rêveberiya Xweser de bûn. Meclîsa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Baûr û Rojhilatê Sûrî di 5'ê Sibata 2021'an de bi tevlîbûna meclîsa zagonsasî ve di civîna 33'êmin a ku pêk aniye de biryar girt ku koordînasyona jin bibe parçeyek ji Rêveberiya Xweser.

Komîta Jin a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî di nav Rêveberiya Xweser de bû saziyeke ku eleqadarî pirsgêrêkêdn jinan çaresar dike. Di ve bingehê de hemû jinên ku di Rêveberiya Xweser de wê bên perwede kirin. Xebatên jinan, biryarên giştî yên ku jinan girtin û polîtaqayên Rêveberiya Xweser wê di çarçoweyeke kordîneyî civakî de bibin.

Di heman demê de avabûna kordînasyonê bû gaveke girînk. Kordînasyona jin a navendî, komîteya jin a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî ji hevserokên meclîsa qanûndanîn (teşrî), ji hevserokên Rêveberiyên Xweser ên herêmî, ji wezîrên jin û di heman demê de ji hevserokên meclîsên sivîl ên Reqa, Minbic û Dêrazorê pêk tê. Ber bi binî ve di herêm, kanton û meclîsên sivîl de nefsa meclîsan tê avakirin. Her kordînasyonek di herêmên xwe de ji tevahî kar û xebata têkîldarî jinan berpirsiyar in. Kordînasyona jin ji bo çaresariya pirsgêrêkên jinan ên wek qanûndanîn, meşandin û edaletê de berpirsiyartî digire ser milên xwe astengiyên heyî ji holê radike. Mafên berfireh ên kordînasyona jin hene. Biryar, tedbîr û pîlansaziyên jinên ku di nav Rêveberiya Xweser de cih digirin kordîne dike.

Kordînasyona jin li gorî pêwîstiya şoreşa jin ku her dem diguhere û pêş dikeve di rêziknameya xwe de hinek guhertin çêkirin. Teva mafên xwe yên hiqûqî ku bi vê rêziknameyê bi dest xistin xûrtkirina rêxistinbûna jinên di nav Rêveberiya Xweser de, diyarkirina stratejiyên jinê û bi kordîne meşandina xebatên jinê armanç digire. Em hinek behsa bendên vê rêziknameyê bikin: erkên xwe yên wek ji bo ku jin di nav pergala Rêveberiya Xweser de hîna çalaktir bibin, ji bo sepandina rêgeza cihêkariya pozîtîf, rol girtina ser milên xwe di di çaresariya pirsgêrêkên jin de heye.

Hinek ji rêgezên kordînasyonê ev in: teşwîqkirina xweparastina jin, têkoşînkirina li dijî tundî, cihêkarî û têkoşînkirina li dijî bazirganiya bedena jin, xebatên ji bo pêşxistina behremendiyên jinên ciwan, dabînkirina wekhevî û edaleta navber jin û zilam.

Hinek ji hedefên kordînasyona jin ev in: Rêxistinkirina çalakiyên taybet ji bo jinan, biryargirtina li ser jinan, rêxistinkirina têkîliyên bi rêxistinên jin ên welatên derve û li ser vê esasê bi van rêxistinan ve avakirina têkoşîneke hevbeş, ji bo pêşketina jinan rêxistinkirina perwerdeyan, diyarkirina polîtîqa û stratejiyên jin, di cihê ku kar dikin de xûrtkirina jinan amadekirina pîlansiyan.

Dîsa li gorî rêziknameyê di civînên Rêveberiya Xweser û meclîsên sivîl de pêşkeşkirina raporan di derheqê rewşa jinan, di rojeva civînê de xistina vê bendê pêwîst e. Ji pê ve di rewşên têkîldarî xebatên jin de divê icbarî kordînasyona jin bê agahdarkirin û biryarên ku kordînasyona jin girtine saziyên ku jin tê de kar dikin divê di nav mehekê de icbarî pêk bîne. Di hemû hemû biryarên derheqê jinan de kordînasyona jin destûrmend e.

Bi ev biryar û guhertinên ku di binyata Rêveberiya Xweser de hatine girtin de vîna jinan a hevbeş hîna xûrtir bû û bi van guhertinan kordînasyona jin hîna bi hêztir bû. Têkoşîna me ya jin bi van gavan wê hîna pêş de biçe.

يتم تعزيز أرادة المرأة في الأدارة الذاتية

تطورت ثورتنا التي تم الإعلان عنها في ١٩ يوليو ٢٠٢٢ لتصبح ثورة نسائية. مع تضحيات كبيرة ونضالات كبيرة ، أدى التحرير التدريجي لأرضنا من احتلال داعش لثورتنا إلى الثورة في شمال وشرق سوريا. لقد عملوا لمدة عشر سنوات في ساحات القتال للدفاع عن الثورة وبناء مقاطعة جديدة. أحد الاختلافات في نظامنا هو تنظيم قوة مشتركة

يتم إنشاء الرؤساء المشاركين والمكاتب النسائية والمجالس النسائية في جميع المؤسسات والمنظمات. من الحكم الذاتي لشمال وشرق سوريا إلى إدارات الحكم الذاتي للمناطق ، تم إنشاء إدارات محلية ولجان نسائية وتنسيق للمرأة في الكانتونات.

حتى عام مضى ، كان التنسيق النسائي في الإدارة الذاتية مرتبطًا بعمل المرأة ، ولكن ليس في الإدارة الذاتية. قررت الجمعية العامة لإقليم الحكم الذاتي لشمال وشرق سوريا في ٥ شباط ٢٠٢١ ، وبمشاركة المجلس التشريعي في جلسته الثالثة والثلاثين ، تنسيق الحكم الذاتي للمرأة كجزء من منطقة الحكم الذاتي.

أصبحت لجنة المرأة في منطقة الحكم الذاتي لشمال وشرق سوريا منظمة داخل منطقة الحكم الذاتي تتعامل مع قضايا المرأة. بشكل أساسي جميع النساء اللواتي سيتم تدريبهن على الإدارة الذاتية. سيكون عمل المرأة والقرارات العامة التي تتخذها المرأة وسياسات الحكم الذاتي ضمن إطار منسق اجتماعيا.

كما كان إنشاء التنسيق خطوة مهمة. التنسيق النسائي المركزي ، اللجنة النسائية لمنطقة الحكم الذاتي لشمال وشرق سوريا ، وتتألف من الرؤساء المشاركين للهيئة التشريعية ، والرؤساء المشاركين للحكومة الذاتية المحلية ، والوزيرات ، والرؤساء المشاركون للمجالس المدنية. الرقة ومنبج ودير الزور. يتم تشكيل مجلس المجالس في المناطق والكانتونات والتجمعات المدنية. كل منسقة في مجال اختصاصها مسؤولة عن جميع الأعمال المتعلقة بالمرأة. التنسيق النسائي مسؤول عن معالجة قضايا المرأة مثل التشريع والإنفاذ والعدالة ، وإزالة الحواجز القائمة. تتمتع المرأة بحقوق واسعة في التنسيق. تنسيق قرارات وتدابير وخطط المرأة في الحكم الذاتي.

لقد أجرى التنسيق النسائي بعض التغييرات في لوائحه بما يتماشى مع الحاجة إلى ثورة نسائية تتغير وتتطور باستمرار. تهدف جميع حقوقها القانونية المنصوص عليها في هذا النظام إلى تعزيز تنظيم المرأة في الإدارة الذاتية وتحديد استراتيجيات المرأة وتنسيق عمل المرأة. دعونا نذكر بعض أحكام هذه اللائحة: مسؤولياتها مثل جعل المرأة أكثر نشاطا في نظام الحكم الذاتي ، لتطبيق مبدأ التمييز الإيجابي ، لها دور تلعبه في حل مشاكل المرأة.

ومن وسائل التنسيق تعزيز الدفاع عن النفس للمرأة ، ومكافحة العنف والتمييز ومكافحة الاتجار بالنساء ، والعمل على تنمية مواهب الشابات ، وضمان المساواة والعدالة بين المرأة والرجل.

ومن أهداف التنسيق النسائي: تنظيم أنشطة خاصة بالمرأة ، واتخاذ قرار بشأن المرأة ، وتنظيم العلاقات مع المنظمات النسائية في الخارج وبناء نضال مشترك مع هذه المنظمات ، وتنظيم دورات تدريبية للنهوض بالمرأة ، وتحديد السياسات والاستراتيجيات النسائية. ، وتمكين المرأة في مكان العمل لإعداد الخطط.

وطبقا للوائح ، فإن تقديم التقارير الخاصة بوضع المرأة في اجتماعات الحكومة الذاتية والمجالس المدنية مطلوب لإدراج هذا البند في جدول أعمال الاجتماع. بالإضافة إلى ذلك ، في الحالات المتعلقة بعمل المرأة ، يجب أن يكون التنسيق النسوي مستنيرًا ويجب تنفيذ القرارات التي تتخذها المؤسسات النسائية في غضون شهر. تنسيق المرأة جائز في جميع القرارات المتعلقة بالمرأة.

مع هذه القرارات والتغييرات التي تم إجراؤها في هيكل الحكم الذاتي ، كانت الإرادة المشتركة للمرأة أقوى ، ومع هذه التغييرات كان التنسيق بين النساء أقوى. نضال النساء بهذه الخطوات سوف يذهب أبعد من ذلك.

LI DİJÎ SERDESTİYA ZİLAMPEREST JI BO SERKEFTINA ŞOREŞA JIN RÊXISTIN Û TÊKOŞÎNA HEVBEŞ

• JÎN AZAD
(Komîteya Amedakar a Sempozyûmê)

Me wek Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) sempozyûmek bi şiyara "Li dijî serdestiya Zilamperest Şoreşa Jin" lidar xist. Vê sempozyûmê xwesteka parastin, pêşxistina şoreşa jin û hevbeşbûna bi jinên Rojhilata Navîn û cîhanê ve nîşan da.

Me serdana yek bi yek gelek sazî û rêxistinên jin ên Bakur û Rojhilatê Sûrî kir ew dawetî sempozyûmê kir. Ji van hinek Meclîsa Jin a Bakur û Rojhilatê Sûrî, Meclîsa Jin a Sûrî, Nivîsgeha Jin aMeclîsa Sûrî a Demokratîk (MSD), Kongre Star, Meclîsa Jin a Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Partiya Pêşerojê Sûrî, Partiya Guhertin a Demokratîk a Kurdistanê, YPJ, Yekîtiya Jinên Suryan, Meclîsa Jinên Ermen û Rêxistina Sara bû. Ev sazî û rêxistinan hema hema giştî di tevlî sempozyûmê bûn.

Ji 11 welatan rêxistinên jinan bi dîmenan mesajên xwe şandin. Ji Efrîqayê heta Emerîkaya Latîn, Ji Ewropayê heya Asyayê û Rojhilata Navîn me di şert û mercên kûrewîbûna emperyaliyetê de pirsgêrêkên ku jin rû bi rû dimînin û pêwîstiya mezinkirina têkoşîna azadiya jin a hevbeş me bi saya vê sempozyûmê careke din dît. Me di wan mesajan dît ku şoreşa Rojava ya jin ji bo jinên cîhanê hîna hêviyeke mezin e. Di mesajên ku hatine şandin de hat diyarkirin ku têkoşîna jinan a bisîleh şoreşa Rojava hîna berbiçav bû. Li dijî gefên ser şoreşê jî mesaj hatin dayin. Bi taybetî jinên Efxanîstanî ku di bin zilma Talîban de ne tecrûbeyên ku em ji hev digirin îfade dikirin.

Partî, sazî û rêxistinên ku mesaj şandin ev bûn: lîga jin a Partiya Komûnîst a Kenyayê, Eniya Gel a Perû, Yekîtiya Jinên Sosyalîst (Ewropa), MLPD (Elmanya), Konferansa Jin a Cîhanê, Tevgera Yekbûyî ya Şoreşê a Jinan (KBDH, Başûrê Kurdistanê), Komelaya Jinên Şoreşger a Efxanîstanê (RAWA), Komîteya Jin a Partiya Demoqrat Welatperêz Sosyalîst a Tûnûsê, Eniya Jin Partiya Şoreşger Komûnîst a Uruguayê.

Rêxistinên ku ji Rojava tevlîbûn jî di wê zanebûnê de bûn ku şoreşa me jin bi bedelên mezin hat bi dest xistin û ji bo jinan tê wateyeke mezin, lê îro bi pisrgêrêkên girînk ve rû bi rû ye.

Di aliyekî de sîtava şoreşa me ya jin di hundirê malan de û di civakê de lawaz e, kuştina jinê, tundiya li ser jinê, întîharên jinê, zewaca zêde, zewaca di temenê biçûk de berdewam dike. Di nîqaşên ku hatin meşandin de bal hat kişandin ku qanûn û deskeftinên jinê bên di nav civakê de bi awayekî xûrt werin sepandin û ji bona vê jî rêxistinên jin hîna zêtetir bên xûrtkirin jin hîna zêtetir bi awayekî çalak di nav jiyana civakî de cih bigire. Pêwîstiya vê rastiyê bi awayekî xûrt hat nîqaşkirin.

Di aliyê din de dewleta Tirk a dagirker bi piştgiriya dewletên emperyalî û dewletên herêmê yên paşverû qismek ji axên şoreşa me dagir kiriye û niha em bi gefên nû ve rû bi rû ne. Parastina şoreşa me di rewşeke pir bingehîn de disekine. Ji bo ku ev êrîş di bingehê de şoreşa me ya jin hedef digirê, ji ber vê yekê divê jin hîna zêdetir rol bigirin ser milên xwe. Di destpêka şoreşa me heta niha artêşa jin YPJ'ê roleke pir girînk lîst û di milê azadbûna jinê de erkên girînk bi cih anî. Dîsa nîqaşa xûrtkirina YPJ'ê xweparastina jinê hat meşandin.

Di beşa sempozyûmê ya duyemîn de li ser şoreşên herêmî û enternasyonalîzma jin nîqaş hatin meşandin û di nîqaşan de bi taybetî li Rojhilata Navîn pêwîstiya yekîtiya jinan hat anîn ser ziman. Ji bo em têkoşînên jinan ên demdirêj û di heman demê de têkoşîna jinên ku di nav têkoşînên civakî de cih digirin bizivîrinin şoreşa jin pêwîst e em tecrûbeyên xwe bikin yek. Li dijî pergala resmaliyeta ku bi serdestiya zilam ve derbasî nav hev bûye têkoşîna wê bi yekîtiyên jinan ên ku di herêmê de û li seranserî cîhanê bên damezrandin serkeftinê bi dest bixe.

Bi şoreşa me ya Rojava derket holê ku têkoşîna jinên cîhanê li dijî pergala kapîtalîzmê ya zilamperest encax bi têkoşîna çekdarî û bernameyeke rêxistineke şoreşger bi ser dikeve. Wek ku di sempozyûmê de jî hat dîtin pêşxistin û parastina şoreşa me di heman demê de wê ji bo jinên cîhanê bibe û ji ber vê yekê parastina şoreşa Rojava ya jin di heman demê de erka jinên Rojhilata Navîn û jinên cîhanê ye.

Di şerê li dijî DAÎŞ'ê ji çar aliyê cîhanê gelek jinên enternasyonal ên wek Îvana Hoffmann, Lêgerîn, Helîn cih girtin û şehîd ketin. Li ser vê esasê hat nîqaşkirin ku pêwîst e em Rojava bikin biryargeha jinên cîhanê, jin dema di aliyekî de di parastina Rojava de cih digirin di aliyekî de jî bi girtina tecrûbeyên ji vir di cîhanê de şoreşên jinê yên nû ava bikin.

Jinên JKŞ'yî ku ji gelek bajaran tevlî vê sempozyûmê bûn encamên ku di berfirehiya amadekariyên vê sempozyûmê yên wek perwerde, civîn û tecrûbeyên jiyanê de derxistin bi jinan re parve kirin. Bi zanebûna guhertinên ku şoreşê di jiyana wan de çêkiriye mecbûriyeta parastina vê şoreşê anîn ser ziman.

Di nîqaşên sempozyûma ku bi du rojevan hatiye lidarxistin de hat dîtin ku jin dixwazin ji tecrûbeyên hev fêr bibin û piştgiriya jinê mezin bikin. Dîsa di nîqaşên ku hatine meşandin de pêwîstiya şênberkirina yekîtiya jinan û avakirina enternasyonalîzma jin, ji bo avakirina enternasyonalîzma jin pêwîstiya rêxistinkirina komcivîn û konferansên cûda hat dîtin.

Di axên şoreşa jinê de, rêxistinkirina sempozyûmeke bi vî rengî ku şoreşa me jin mezin bike kelaceneke mezin da em jinên komûnîst. Ev sempozyûm di heman demê de di demeke ku şoreşa me di bin gefên nû yên li ser şoreşê de hat lidarxistin. Ji ber vê yekê mijara yekemîn a "Di têkoşînên çekdarî de jin" ji bo pirsgêrêkeke aktûel wek bersiveke şênber bû. Em wek jinên komûnîst bi hêza ku me ji vê sempozyûmê girtiyê em ê li dijî dagirkeran têkoşîna xwe mezin bikin.

ضد القمعية الذكورية لنجاح ثورة المرأة التنظيم والنضال المشترك

بصفتنا نساء شيوعيات ثوريات ، نظمنا ندوة تحت شعار " ضد الهيمنة الذكورية بثورة المراة نحو الانتصار ". أظهرت هذه الندوة الرغبة في الحماية وتطوير ثورة المرأة والتضامن مع المرأة في الشرق الأوسط والعالم.

قمنا بزيارة العديد من المنظمات والمنظمات النسائية في شمال وشرق سوريا التي اختتمت الندوة واحدة تلو الأخرى. بعض هذه المنظمات هي التجمع النسائي لشمال وشرق سوريا ، مجلس المراة السورية ، مجلس سوريا الديمقراطية (MSD) ، مجلس المراة لحزب الاتحاد الديمقراطي (PYD) ، حزب سورية المستقبل وحزب التغيير الديمقراطي الكردستاني ، و YPJ ، واتحاد المرأة السورية ، ومجلس النساء الأرمن ، ومنظمة سارة لمنهضة ضد العنف. شاركت جميع هذه المؤسسات والمنظمات في الندوة.

وأرسلت المنظمات النسائية من ١١ دولة رسائل مصورة. من أفريقيا إلى أمريكا اللاتينية ، ومن أوروبا إلى آسيا والشرق الأوسط ، رأينا مرة أخرى المشاكل التي تواجهها النساء في سياق تعميق الإمبريالية والحاجة إلى زيادة النضال المشترك من أجل تحرير المرأة من خلال هذه الندوة. رأينا في تلك الرسائل أن ثورة المرأة في روج افا لا تزال تمثل أملًا كبيرًا للنساء في جميع أنحاء العالم. وجاء في الرسائل المرسلة أن الكفاح المسلح للنساء المسلحات للثورة في روج افا لا يزال وشيكا. كما تم إرسال رسائل ضد تهديد الثورة. عبرت النساء الأفغانيات على وجه الخصوص ، اللاواتي لم يتعرضن لقمع طالبان ، عن التجارب التي نتشاركها

الأحزاب والمنظمات والمنظمات التي أرسلت الرسالة هي: الرابطة النسائية للحزب الشيوعي الكيني ، والجبهة الشعبية البيروفية ، والاتحاد النسائي الاشتراكي (أوروبا) ، و حزب الماركسي اللينيني (MLPD) (ألمانيا) ، والمؤتمر النسائي العالمي ، الحركة الثورية الموحدة لنساء (KBDH). جنوب كردستان ، وجمعية النساء الثوريات في أفغانستان راوا (RAWA) ، ولجنة المرأة في الحزب الوطني الاشتراكي الديمقراطي التونسي ، والجبهة النسائية للحزب الشيوعي الثوري في أوروغواي.

كانت المنظمات التي شاركت من روج افا تدرك أيضًا أن ثورتنا النسائية قد تحققت بتكلفة كبيرة وكانت تعني الكثير للنساء ، لكنها اليوم تواجه تحديات كبيرة.

